KOVARA KURDÎ A MIZAHÎ / HUMORISTISK KURDISK TIDNING



ÇAWA LI HESAB BÊ

TURK→KURT AN KURT→TURK

KOVARA WE JI DU MEHAN CAREKÊ DERTÊ

VARANNAN MÅNAD UTKOMMER

hejmar: 9

87

www.arsivkurdi.org

KOVARA KURDÎ A MIZAHÎ
HUMORISTISK KURDISK TIDNING
JOURNAL HUMORISTIQUE KURDE

ANSVARIG UTGIVARE
OCH REDAKTÖR:

MAMOSTE

XWEDÎ BERPIRSIYAR
Û REDAKTOR:

MAMOSTE

NAVNÎŞAN / ADRESS:
c/o Gezgın
Axbyplan 5
163 73 SPÅNGA/SWEDEN

BUHAYÊ WÊ / PRIS:
10 Skr. 10 Ff, 3 DM.

ABONA SALEKÎ : 70 Skr.
PRENUMERATION: 70 Skr.

TFN: 08/760 81 23
POSTGIRO: 496 03 75-6
ISSN: 0283-099X

Gelî xwendevanên hêja'

Vaye hejmarek nûh a ÎSOT'ê pêşkêşî we dibe, lê ez ne di wê baweriyê de me, ku hejmareka din jî pêşkêşî we bikim.

Wek hûn dizanin Îsot bi piranî bi şek lekî amatorî: bi karîkatur û nivîsên xwe û bi aborî û belavkirina xwe li ser milê min e. Ji alî aborî ve wek berpirsiyarê Isotê hew taqet û mecala min heye ku ez ji bin barên kovarê derkevim.

Bi kurtî ku ez bêjim, Jiyana kovara me li vir qediya.

Ên heta nuha bi abonetî, bi nivîs û şeklên din alîkarî ji kovarê re kiri ne, bi navên kovarê ez gelek spasi wan dikim.

Di xweşiyê de bimînin.

En bûne abonên Isot'ê: perên wanî ma yî ku zêdey 10 kronî be, wê ji navnî şana wan re bê şandin.

MAMOSTE

www.arsivakurdi.org

Kongra 2. a ÎSOTÊ

Kongra ÎSOT'Ê ya 2. li dawiya dawî civiya. Ji 444 endaman 44 endamên super aktîf beşdarî vê kongrê bûbûn. Her çiqas xelk dibêje "Divê bi kêmanî nîvê endaman beşdarî kongrê be", erê wusa ye. Lê ew ne ji bo me ye.
Ma Xwedê heye. Em hinekî cihê ne. Erê em 44 bûn, lê her yek ji me bi 44'a ye.
Çend hevalên ku nehatibûn jî di şûna xwe de MORA xwe şandibûn. Di dawiya kongrê de me jî gelek qerar girtin. Lê em ji we re nabêjin. Ew ne karê we ye.

Îdare Heyetî ya
ÎSOTÊ ya TAZE



STUDÎA ÎSOTÎCA

KOVARA ILMÎ Û ZANISTÎ YA LÊKOLÎNÊN KÛRÛ DÛR

NIVÎSKARÊN KOVARÊ

BERTRAND RUSSEL
MAHMUDÊ CAREK DERWÊŞ BÛ
Mr. LUTUFZADE ALLAHALLAH
BERTOLINO FRANSISKO
Prof. Dr. ZANE ZANYARÎ
JEAN PAUL SARTRE

COLLEBRATEURS: (ALÎKAR)

Dr. DUTA WEYSELQERANÎ
Namzed Dr. HEMSOR ÇILSOR
CAMCIZADE SIDIK EFENDÎ
FEHMETLÎ MEHEMED
BEKÇIYÊ KANIYA MEZIN

STUDÎA ÎSOTÎCA JI NEH SALAN CAREKÊ DERDIKEVE. HETA NUHA BI HEFT ZIMAN Û DU DIYALEKTAN DERDIKET. LÊ LI SER DAXWAZIYEKE GELEMPERÎ EMÊ ÊDÎ STUDÎA ÎSOTÎCA BI 14-15 ZIMANÊN CÛR BE CÛR JI ŞEŞ SALA CAREKÊ DERKÎNIN Û BIWEŞÎNIN Û BELAVBIKIN...

EV HEJMAR JI DU RÛPELÊN SERANSER PÊK TÊ.

KOVARA HEVÎR, EWÊ ÊDÎ BI TESE Û PERGAL Û AWAYEKÎ NÛ DERKEVE.
NUHA ENDAMÊN RADAKSIYONA WÊ LI HEV DIGERIN.

www.sivakurdi.org

Di vê hejmara ÎSOT'ê de jî, emê karîkaturîstekî li Kurdistana Turkiyê hatiye dinyê pêşkêşî we xwendevana bikin.

İsmail GÜLGEÇ

ÎSMAÎL GULGÊÇ DI 1947'DE LI GAZÎANTEPÊ HATIYE DINYÊ.
DI DIBISTANA BIGÛK DE "ÎLKOKUL" NEXWEŞ KET DEV JI DIBISTANÊ BERDA.
DI PIRÎ ROJNAMEYÊN TURKIYÊ DE KARÎKATUR ÇÊKIRINE.
AMUHA DI ROJNAMA CUMHURIYET'Ê DE DIXEBITE.

www.arsivkurdi.org

ÇALIM ŞEWQÎ

MIN DERÎ LI KOVARA ÎSOTÊ GIRT. KA WÊ DORA KIJANÎ BÊ EMÊ HÊ BIBÎNIN. KOVARÊ ME ÊV KOVAR Û XWENDEVA-NÊN ME ÊV XWENDEVAN BIN WÊ HÊ YASÎN LI SER GELEKA BÊ XWENDIN

JI HINDIKBÛNA RÛPELAN ME CÎH NEDA ÇALIM ŞEWQÎ BIBUHIRIN...

LI VIR REWŞ HATIYE GUHERTIN... KU HÛN NEHÊLIN JINA MIN TÊKEVE CIVÎNÊN POLÎT BUROYÊ, EZ EDÎ DI PARTIYA WE DE CÎH NAGIRIM.



NÊVÎ JI MIN RE Û NÊVÎ JI TE RE, ME PERÊ XWE WEK HEV TÊ DAYE

Profesorekî Tirk ji şagirtên xwe pirsî:

-Insanên yekemîn kê ne,ku hatine dinyê?

Yek ji şagirtên wî bersîv da û got:

-Adem û Hawa.

-Gelo ji kîjan miletî bû ne?

-Tirk in, Tirk...

-Eêê...Tu çawa zanî ku Adem û Hawa Tirk in?

-Belê ez zanim, gelek rehet e. Xaniyekî tunebuye ku serê xwe têxin binî, kincekî wan tunebuye ku li xwe kin,ji bo xwarinê jî tiqûtenê sêveka wan hebuye ku bixwin. Navê vê jiyana xwe jî danîne cennet. Ma ji me Tirka pêftir kê kare wusa bibêje'.

www.arsivakurd.org

Nûçeyên Îsotê

Qaz Holmêr û Rifat el sayat ji sosîyala Rinkeby'ê hatin qewirandin. Her çiqas ev uerdu camêrên han ji alî televiziyona Swêd ve wek "Swêdiyê salê" hatibûn hilbijartin jî, lê çi feyde herdu jî anuha betal in. Ji bo îdara mala xwe bikin dixwazin herin sosiyala Rinkeby'ê. Lê penaberên kurd ên li Rinkeby'ê dijîn li hember vî tiştî ne.

Sivan

Hozanê Kurd Şivan ji ber ku li Iranê bi tirkî stranan gotiye ji alî rojnemevanê Kurd Lutif Heqdixwo ve 15 sal hepsa wî tê xwestin. Her çiqas neheqiyek di vê heqiyê de hebe jî Lutif Heqdixwo wuha dibêje: Çima Hukumeta Tirk (ku nake serîk pîvaz), ji bo Ibo yê me 5 sal hepis dixwaze, çima ezê ji Şivan re 15 sal hepis nexwazim. ...

İsveç'te söylediği türkü yüzünden DGM'de yargılanacak

İbrahim Tatlıses'e Kürtçülük suçlaması

İsveç'te verdiği konser sırasında Kürtçe türkü söylediği iddia edilen Türk Halk Müziği'nin ünlü sesi İbrahim Tatlıses hakkında İstanbul Devlet Güvenlik Mahkemesi

YAHUDÎ

Piştî ku me di Kurdekan PRESS te bihîst ku Kurdên Yahudî jî hene: me biryar da ku helbesta vê mehê wê ev be.

Ey welato,
Fille hato,
Meyt hilato,
Mellê me nehato,
Qamçî li çava keto....

NEWROZ

Newroza Kurda li hûndirê welat ji alî kevneperestan ve û li derveyî welat ji alî "super komunîst"tan ve xwest bê qedexe kirin.

tifkinê!

Li gor meclîsa ANAP'ê biryara hatiye dayîn: Gerek di hatina Turgut Ozal de ji Amerîkayê, kes neçe rûyê Ozal û bi destê wî negire. Lê tu biryar nehatiye stendin ji bo ku ên dixwazin tifkin serçavê Ozal. Hima kê çiqas tif jê qediya!...

RÎCAYEK

Du heb Kurdên herî polîtîk-multecî ji bo ji xwe re SMOKÎNEKÎ kirê bikin! li alîkariya Swêdîkî baş bi ziman dizane digerin.

qerentîna

Partıyek Kurd hıngî ji hev perçe buye ji alî UNESCO yê ve nuha di bin qerentînayê de ye.

Ev cara dudiyane ku UNESCO bi hewara Kurda ve tê. Cara pêşîn ji bo cinsek cûk ên li Kurdistanê dijîn "KELAYNA KUŞU" û ev car ji bo partiyek Kurd. Armanca UNESCO yê ev e ku neslê van ji dinyê xelas nebin.



BY-PÎSS

Serokwezîrê Tirkiyê Turgut OZAL li Emerîkayê emeliyata BY-PÎSS derbaskir.

Ji ber ku dilê (qelbê) wî hîngî pîs bû, doktor mecbûr man bi emeliyata BY-PÎSS'ê hinek pîsîtî ji dilê OZAL derxin.

www.arsivakurdi.org



ÇAWUŞÊ ROJHELATA NAVÎN.

LI ROJHELATA NAVÎN NÛH TÊN GERANDIN

www.arsivakurdi.org

BAVÊ NAZÊ ji me re bersîvek şandiye, em spasî wî dikin. Em bersîvê bêî ku destê xwe lêxin pêşkêşî we xwendevana dikin, tiştê ku em bêjin wê ev be: Romanek bi vî navî bi kurdî nehatiye çapkirinê. Ne hewceye ji bo vê rastiyê meriv hewqas çiva bide xwe.

Bersiv

Di hejmara (8)-de ya kovara [redacted], „Îsab" hatibû nivîsandin ku serêşek ji xwe re çêkiribû, da ku romana „Giyayên bi xwîne avdayîs bibîne. Ji ber vê yekê nivîsarê wê dibêje ku; „... em têde ketine şikê. Gelo bingeha vê romana kurdî heye an na?"

Bi xwe, wê şikên, „Isotê" di ciyê xwe de bin, eger çapxanên kurdî ev çapxanebin. Tiştê ku ji „Îsotê" tê xwestin ew ku îsoteke bide ber bêvilên xwedîyên çapxanan, lelki bi pozên wan bişewitin û „Giyayên bi xwînê avdayîs" çap bikin.

Bill

DI KONGERA FEDERASYONÊ DE KURDÊN ME JÎ BÛN XWEDÎ ŞÛR
JI VAN ŞÛRAN HINEK EV BÛN:

ŞÛRÊ HENEKAN...

ŞÛRÊ ÇEMÊ FIRATÊ...

EV ŞÛR DESTÊN MERIVA DILERIZÎNE...

ŞÛRÊN COMERDAN KO NABE...

ŞÛRÊN BERBANGÊ...

ŞÛRÊN ŞAŞÎ ÊN TEBIÎ...

ŞÛRÊN KULA DERMAN DIKE

www.arsivakurdi.org

Bijî Kurd û Kurdistan

û HINEK ŞAMPUWAN

Şoreş : Kî ku bêje ez sosyalîst im, pêşverû me, dibê xwe wekî min amade bike û here Kur distanê şer bike şer!

Tirso : Tu rast dibêjî Şoreş, bijî ji te re. Tu her bijî!

Şoreş : Welat... Çiya. Zinar.. Şi keft' Çima hûn jî wek min naxwazin herin Kurdistanê û şer bikin?

Gişto : Rast e, rast e. Dibê meriv here!...

..Şeş meh şûnde..

Tirso : Şoreş tê kengî herî Kurdis tanê şer bikî, vaye şeş meh derbas bû hîn tu diçî!

Şoreş : Ezê biçim! Ecele neke!

..Du sal şûnde..

Gişto ::Şoreş, te çû Kurdistan ava kir û tu hatî?

Şoreş : Ezê rojekê herim, tuê bibînî.

..Deh sal şûnde..

Tirso : Hîn tu li van deranî? Ka tuê biçunay Kurdistanê?

Şoreş : Em bêjin ez çûm, gelo ezê li ku rakevim! Dûra ezê serê xwe li ku bişom. Ma ava germ xew-lî, şampuwan heye an na? Xwa rin wê ji ku bê! Dibê ez van meselan li vir (Swêd) halbi-kim. Hingê tu birê xwe Şoreş bibîne! Ez rojekê li vê derê namînim!...

KOLIKÎ

AGAHDARÎ

Du heb başçawuşên Tirk li garnîzonê rûniştibûn bi hevdu re diaxifîn.

-Bavêmin dibêje ku "li vê dinyê tenê û tenê usulek heye ku meriv kare bi xweydana serê xwe û bi he lalî pera qezenç bike"

Başçawuşê din pirsî:

-Gelo ev usul kîjan e?

—Errikê' Tu jî nizanî?



—TU KARÎ ALÎ MIN BIKÎ?
– BELÊ, SERÇAVA

– TU KARÎ LEMBÊ BIGUHERÎNÎ?
— BELÊ!

– ÎHTIYACA MIN BI ALÎKARÎ HEYE!
– EZ TÊM.



—TU KARÎ JI MIN RE PAKÊTEK CIXARE BISTÎNÎ?
— NA!

BIYANIYÊ PÎSÎ HERAM!

www.arsivakurdi.org

MEKTEB-ÛL CUMHURIYE

ISOT

KOVARA KURDÎ A MIZAHÎ
HUMORISTISK KURDISK TIDNING
JOURNAL HUMORISTIQUE KURDE

ANSVARIG UTGIVARE OCH REDAKTÖR : MAMOSTE
ADRESS : c/o Gezgin, Axbyplan 5, 163 73 SPÅNGA
TFN: 08/760 81 23 POSTGIRO: 496 03 75-6
BUHAYÊ WÊ / PRIS : 10 Skr, 10 Ff, 3 DM. PRENUMERATION 70 Skr
ISSN: 0283-099X